# Ewlekariya civakî

Sazûmana ewlekariya civakî
Bergiriya ji bo xanenişînê /bergiriya ji bo teqawîdiyê
Jikarketin /astengdarî
Bêkarî
Nexweşî û qeze
Dêûbavbûn û malbat
Alîkariya civakî / Alîkariya sosyalê

# Sazûmana ewlekariya civakî

Nişteciyên Swîsreyê bi riya ewlekariyên/sîgorteyên civakî ji rîskên cihêreng tên parastin. Ewlekarî/sîgorte, wek mînak, gava kesek karê xwe winda bike yan nexweş bikeve alîkariyê dikin. Ew alîkariya malbatan û kesên kalûpîr jî dikin.

## Xalên bingehîn

Ewlekariya civakî ji aliyê nişteciyên Swîsreyê ve tê fînansekirin. Prensiba destekdana hev li vê derê tê bikaranîn: Piraniya gel pere dide, da ku kes û komên diyar alîkariyê bistînin. Ewlekariya civakî bi piranî pêwîstî ne. Tibaba alîkariyê rasterast ji mehaneya kesên dixebitin tê qutkirin. Kesên karsaz, karmendên serbixwe û kesên kar nakin jî tibabeke fînansî didin.

## Xizmet

Ewlekariya civakî di hin reşên diyar ên jiyanê de alîkariyê didin mirovan. Ew pereyê rojane, mehaneya xanenişîniyê yan lêçûnên wan an jî lêçûnên nexweşî yan qezeyê digirin ser xwe. Hemû ewlekariyên civakî/sîgorteyên civakî ji aliyê dewletê ve tên birêzgirkirin û sazkirin.

## Mirov kengî alîkariyê distîne?

- Di dema kalûpîriyê de, di rewşa mirin û seqetiyê de (3 stûn: AHV / IV, xanenişîniya pîşeyî, xanenişîniya taybetî)
- Di bûyera nexweşî û qezeyê de (Sîgorteya nexweşî û qezeyê)
- Di rewşa dayikbûnê de (Alîkariya dayikbûnê)
- Di rewşa bêkarmayînê de (Sîgorteya bêkariyê)
- Gava zarokeke mirov çêbibe (Alîkariya malbatê)

## Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-baselstadt.ch/ku/soziale-sicherheit/sozialversicherungssystem

# Bergiriya ji bo xanenişînê /bergiriya ji bo teqawîdiyê

Bi riya bergiriya ji bo xanenişîniyê tê ewlekirin, ku ji bo kesên xanenişîn/teqawîd bibin têrî jiyana wan pere bimînin. Sazûmana bergiriyê ya Swîsreyê li ser sê stûnan e: Sîgorteya kalûpîrî û mîrateyê (AHV), bergiriya pîşeyî (sindoqa xanenişîniyê-Pensionskasse) û bergiriya dildarî ya ji bo xanenişîniyê (3. stûn).

## Sîgorteya kalûpîrî û mîrateyê (stûna 1., 1. Säule)

Sîgorteya kalûpîrî û mîrateyê (AHV) saziyeke dewletê ye. Piraniya kesên gihiştî, divê ji bo wê tibabekê bidin. Ev tibab ji bo kesên di karekî de bi cî bûne rasterast ji mehaneya wan tê qutkirin, lê karsaz nîvê wê hildigire ser xwe. Kesên serbixwe kar dikin yan kesên bêkar, divê li ba fona tazmînatê (Ausgleichkasse) agahiyan bistînin, bê ew çawa dikarin tibaba xwe bidin. AHV mehaneyekê dide kesên xanenişîn/teqawîd bûne. Zêdebûna tibaba mehaneyê girêdayî pereyê berê hatiye razandin e. AHV di rewşa mirinê de alîkariya hevjîn û zarokên kesa/kesê mirî (mûçeya bîmayîn û sêwîbûnê) dike. Her yek nasnameyeke AHVê ya bi jimara sîgorteyê ya şexsî distîne.

## Bergiriya pîşeyî (stûna 2., 2. Säule)

Carina AHV tenê têrê nake, ku mirov piştî xanenişîniyê jiyana xwe wek berê bidomîne. Ji ber vê yekê ji bo kesên kar dikin bergiriyeke pîşeyî heye (fona xanenişîniyê-pensionkasse), ku ev yek ji tibabeke diyar a hatina salaneyê pê ve pêwîstî ye. Tibaba were dayîn bi vê sedemê rasterast ji mûçeyê mehê tê qutkirin, divê karsaz herî kêm nîvê wê bide. Kesên serbixwe nabe ku vê tibabê bidin. Lê belê ew dikarin vê yekê dildarî bikin, ji ber vê yekê ew bi xwe berpirsyar in. Pereyê di fona xanenişîniyê de hatiye civandin di dema kalûpîrbûnê de herwiha yan wê wek mûçeyê xanenişîniyê yan jî bi carekê re were dayîn. Di rewşên diyar de, dikare pere ji berê ve jî were dayîn: Gava mirov şîrketa xwe ava bike, bar bike derveyî Swîsreyê, gava mirov ji bo xwe xaniyekî lê bike yan malekê bikire.

## Bergiriya dildarî ya kalûpîriyê (stûna 3., 3. Säule)

Stûna 3. bergiriyeke dildarî ya kalûpîriyê ya kesane ye, ku bi daxistina ji bacê tê xelatkirin. Ew dikare bi riya bankan an şîrketên sîgortayê were çêkirin. Ji bo di dema kalûpîriyê de di destê we de hinek pere bimîne, civandina pereyan a bi stûna 3. tê pêşniyarkirin.

## Xizmetên pêvekî

Kesên kalûpîr ên tevî AHV û fona teqawîdiyê pereyê distînin têrî debara jiyana wan nekin jî xwediyê mafê stendina alîkariya fînansî ya ser-dagirtinê ne (Ergänzungsleistungen). Divê ji bo vê yekê serî li saziya alîkariya civakî bidin. Bi zagonan hatiye zelalkirin, bê mafê kê yê stendina alîkariya serdagirtinê/pêvekî heye. Alîkariya pêvekî bi riya kesên bacê didin tê fînansekirin.

## Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-baselstadt.ch/ku/soziale-sicherheit/altersvorsorge

# Jikarketin /astengdarî

Kî ji ber sedemên tenduristiyê ji bo demeke dirêj nikaribe bi tevayî yan qismî kar bike, mafê xwe yê stendina alîkariya fînansî ya bi riya sîgorteya jikarketinê (IV) heye. IV tenê pere nade. Ew berî her tiştî ji bo di jiyana kar de karibin dest bi kar bikin an dîsa kar bikin, alîkariya kesên sîgortekirî dike.

## Sîgorteya jikarketinê

Sîgorteya jikarketinê (IV) saziyeke dewletê ye. Divê piraniya kesên gihiştî tibabeke alîkariyê bidin. Ev alîkarî ji bo kesên kar dikin, rasetrast ji mehaneya distînin tê qutkirin, karsaz nîvê wê hildigire ser xwe. Kesên serbixwe kar dikin an bêkar in, divê ji bo hînbûna awayê dayîna alîkariya xwe serî li fona tazmînatê (Ausgleichskasse) bidin.

## Alîkariya bi riya sîgorteya jikarketinê

Kesên ji ber sedemên tenduristiyê (bedenî yan derûnî) herî kêm salekê nikaribin bixebitin an qismî dikarin bixebitin, mafê wan ê stendina alîkariya bi riya IV heye. IV alîkariyê bi awayê mûçeya mehane dide. Ev yek tenê gava kesa/kesê sîgortekirî ji sedema astengdariya xwe êdî nikaribe dest bi jiyana kar bike, pêk tê. IV alîkariya kesên astengdar dike ku karekî li gorî qeweta xwe jî bibînin. Alîkariya bi riya IV, divê bi serlêdana li fona teqawîdiyê (Ausgleichskasse) were daxwazkirin.

## Alîkariya pêvekî

Kesên tevî alîkariya bi riya IV ji bo jiyana xwe hindik pere distînin, mafê wan ê stendina alîkariya pêvekî ya fînansî (Ergänzungsleistungen) heye. Ji bo vê, divê serî li saziya fona xanenişîniyê bidin. Di zagonê de bi zelalî hatiye diyarkirin, bê mafê kê yê stendina alîkariya pêvekî heye. Alîkariyên pêvekî ji aliyê kesên bacê didin ve tê fînansekirin.

## Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-baselstadt.ch/ku/soziale-sicherheit/invaliditaet

# Bêkarî

Hemû kesên di karekî de bi cî bûne li hember bêkariyê ewlekirî ne. Kî betal bimîne, bi gelemperî ji bo demeke diyar alîkariya diravî distîne. Kesên bê kar mane, divê serî li Navenda Navbeynkariya Kar (RAV) bidin. Ev der di dîtina ciyê kar de alîkariyê dide.

## Sîgorteya bêkariyê

Sîgorteya bêkariyê (ALV) saziyeke dewletê ye û ji bo hemû kesên di karekî de bi cî bûne pêwîstî ye. Tibaba her meh were dayîn rasterast ji mehaneyê, mûçeyê tê qutkirin û karsaz nîvê wê digire ser xwe. Kesên serbixwe kar dikin, nikarin xwe li ba sîgorteya bêkariyê bidin sîgortekirin. Kî bê kar bimîne, ji qaseya bêkariyê mehaneyeke alîkar distîne (Pereyê bêkariyê). Bê kengî û çiqas zêde pereyê bêkariyê (Arbeitslosengeld) wê were dayîn, girêdayî faktorên cihêreng e. Wek mînak, mirov demeke çiqasî dirêj xebitiye yan ji ber çi sedemê bêkar maye.

## Pêvajoya rewşa bêkariyê

A baş berî roja dawî ya kar, herî dereng roja destpêkê ya bêkarmayînê, divê mirov bi lez serî li Navenda Navbeynkariya Kar a Herêmî (Regionales Arbeitsvermittlungszentrum, RAV) bide. Li wê derê wê hemû gavên piştre werin ravekirin.

## Navenda Navbeynkariya Kar a Herêmî

Navenda Navbeynkariya Kar a Herêmî (RAV) alîkariya we dike, ku bi lez dîsa ciyekî kar bibînin. Gava mirov pereyê bêkariyê distîne, tevlêbûna axavtinên şêwirmendiyê yên li ba RAVê pêwîst e. Lê RAV kurs an bernameyên mijûlbûnê jî pêşkêş dike. Tevlêbûna qismekî ji van jî herwiha pêwîstî ye. Kesên hîn li Swîsreyê qet nexebitîne û li karekî digerin jî dikarin xwe li ba RAVê bidin qeydkirin. Lê ew pere nastînin.

## Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-baselstadt.ch/ku/soziale-sicherheit/arbeitslosigkeit

# Nexweşî û qeze

Kî li Swîsreyê rûdine, divê sîgorteyeke xwe ya qeze û nexweşiyê hebe. Sîgorteyên taybetî di rewşên qeze, nexweşî yan ducanîbûnê de lêçûnan digirin ser xwe. Divê piştî hatina Swîsreyê di nav sê mehên destpêkê de her du sîgorte werin çêkirin.

## Sîgorteya nexweşiyê / Sîgorteya bingehîn

Divê hemû niştecîyên li Swîsreyê bi xwe sîgorteyeke nexweşiyê (Sîgorteya bingehîn, Grundversicherung) bidin çêkirin. Kî were Swîsreyê ji bo vê sê meh dema xwe heye. Ger mirov di van sê mehan de nexweş bikeve, mesref wê bi awayê paş de werin hesapkirin. Sîgorteya bingehîn ji aliyê jimareke zêde yên şîrketên sîgorteya nexweşiyê (Krankenkassen) yên taybet ve tên pêşkêşkirin. Hilbijartina şîrketa sîgortaya nexweşiyê azad e. Divê ev şîrketên sîgorteya nexweşiyê hemû kesên li Swîsreyê dimînin qeyd bikin.
Kesên tên sîgortekirin tibabeke (prîmeke) mehane didin. Ev tibab (prîm) li gor şîrketa sîgorteya nexweşiyê û modela sîgorteyê bilind dibe, ji bo wê, divê mirov derfetên ew pêşkêş dikin bide ber hev. Mirov dikare şîrketa sîgorteya nexweşiyê herwiha heta dawiya mijdarê ji bo sala bê biguherîne. Sîgorteya bingehîn ne tenê mesrefên gava mirov nexweş bikeve dide, ew ji bo ducanîbûn û zarokanînê jî mesrefan dide. Xizmetên wan bi zagonê hatine diyarkirin.
Baldarî: Divê lêçûnên çêkirina diranan an çêkirina berçavkan bi gelemperî bi xwe bidin an jî di ser sîgorteyeke alîkar a dildarî re werin hesapkirin.

## Sîgorteya qezeyê

Kesên di karekî de bi cî bûne, ger di hefteyekê de zêdeyî 8 saetan dixebitin, bi awayekî jiberxwe (otomatîk) ji aliyê karsaz ve li hember qezeyên di dema kar de û di dema vala de tên sîgortekirin. Kesên ji vê kêmtir dixebitin, di demên vala de ne sîgortekirî ne û divê ew bi xwe li ser sîgorteya xwe ya qezeyê rawestin. Ev yek ji bo hemû kesên serbixwe kar dikin û kesên kar nakin jî derbasdar e. Kesên kar nakin, divê xwe li ba şîrketa sîgorteya xwe ya nexweşiyê li hember qezeyan sîgorte bikin. Kesên serbixwe kar dikin jî dikarin li ba şîrketên din ên sîgortayê ewlekariya qezeyê çêkin. Divê kesên sîgortekirî tibabekî (prîmeke) mehane bidin. Ji bo kesên di karekî de bi cî bûne, ev yek rasterast ji mehaneya wan tê qutkirin.

## Kêmkirina tibabê/kêmkirina prîmê

Kesên nikarin tibaba sîgorteya nexweşiyê bidin, di hin mercan de dikarin daxwaza kêmkirina tibaba (prîma) (Prämienverbilligung) sîgortaya bingehîn bikin. Ji bo bidestxistina kêmkirinê, divê mirov formeke serlêdanê bişîne û agahiyên maldarî û hatineya xwe nîşan bide. Ger serlêdan were pejirandin, mirov ji meha bê û wir de kêmtir prîmê dide. Saziya alîkariya civakî li ser kêmkirina prîmê agahiyan dide û qeydkirinê dipejirîne.

## Sîgorteyên pêvekî yên sîgorteya bingehîn

Mirov dikare bi awayekî dildarî sîgorteyên pêvekî yên cihêreng (Zusatzversicherungen) ji bo sîgorteya mecbûrî ya bingehîn, bide çêkirin. Ev sîgorteyên pêvekî ji bo mesrefên ji aliyê sîgorteya bingehîn ve nayên dayîn, wek mînak ji bo çêkirina diranan tên çêkirin. Sîgorteyên pêvekî hema hema ji aliyê hemû şîrketên sîgorteya nexweşiyê ve tên pêşkêşkirin. Şîrketên sîgorteya nexweşiyê dikarin bi xwe biryarê bidin, bê ew dixwazin hin kesan sîgorte bikin an nekin û ew dikarin şertûmercan bidin pêş.

## Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-baselstadt.ch/ku/soziale-sicherheit/krankheit-und-unfall

# Dêûbavbûn û malbat

Zaroka kê hebe, ew li Swîsreyê alîkariya fînansî ya ji bo zarokê û ji bo perwerdeyê distîne. Mafê dayikên kar dikin heye, ku ew bi çêbûna zarokê re herî kêm 14 hefteyan bînvedana dayikbûnê ya heqê wê tê dayîn bikin.

## Alîkariya diravî ya dayikbûnê

Jinên gava zarok ji wan re çêdibe kar dikin, mafê wan ê bînvedana dayikbûnê (Mutterschaftsurlaub) ya 14 hefteyan a heqê wê were dayîn heye. Di vê demê de, wê herî kêm ji sedî 80 mehaneya wan were dayîn. Divê jinên bêkar an yên nikarin kar bikin serî li fona tezmînatê bidin, bê mafê wan ê stendina alîkariyê heye. Li vê derê rêzgirên taybetî hene, ku dayik piştî çêbûna zarokê di heşt hefteyên pêşîn de nabe kar bikin (parastina dayikê, Mutterschutz).

## Bînvedana bavikbûnê

Mafê bavan heye, piştî çêbûna zarokê du hefteyan bînvedana bavikbûnê (Vaterschaftsurlaub) ya heqê wê were dayîn bistînin. Berûvajî bînvedana dayikbûnê, bînvedana bavikbûnê guherbar e: mirov dikare vê bînvedanê bi carekê re yan jî roj bi roj bistîne. Lê belê ev yek tenê di nav şeş mehên piştî çêbûna zarokê de pêkan e.

## Alîkariya malbatî / Tezmînata malbatî

Kesên xwedîzarok wê bi tezmînata malbatî (Familienzulagen) alîkariya fînansî bistînin. Ev yek wê ji bo zarokên heta 16 saliya xwe wek tezmînata zarokê û ji bo ciwanên xwendekar ên heta 25 saliya xwe wek tezmînata xwendinê were dayîn. Hemû dêûbavên kar dikin (yên serbixwe dixebitin jî), an jî dêûbavên kar nakin an kêm pere distînin tev ji vê tezmînatê distînin. Tezmînata kesên kar dikin, tevî mûçeyê wan bi mehaneya wan re tê dayîn. Agahiyên zêdetir ên li ser tezmînata malbatî karsaz û ciyên ewlekariya civakî didin. Çiqasbûna tezmînata malbatî li gor kantonan tê guhertin.

## Tibaba alîkariya kirêya malbatî

Malbatên hindik pere bi dest wan dikevin, di bin hin şertên diyar de, dikarin ji bo kirêya xaniyê xwe tibabeke alîkariyê bixwazin (Familienmietzinsbeiträge). Çiqasbûna tibaba wek alîkarî were dayîn, girêdayî hatineya diravî ya malbatê, maldariya heye û bilindbûna kirê ye.

## Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-baselstadt.ch/ku/soziale-sicherheit/elternschaft-und-familie

# Alîkariya civakî / Alîkariya sosyalê

Alîkariya civakî piştgiriya mirovên ji bo debara xwe ya malê kêm pere bidest dixin û ji saziyên ewlekariya civakî alîkariya fînansî hindik distînin an qet nastînin, dike. Armanc ev e, ku mirov karibin careke din xwe bigihînin asta debara xwe bi xwe bikin. Ev ne sîgorteyek e, berûvajî alîkariyeke bi riya dewletê ye.

## Alîkariya civakî / Alîkariya sosyalê

Alîkariya civakî (Sozialhilfe) alîkariya hemû mirovên li Swîsreyê yên hewcedarê stendina alîkariyê ne, dike. Ew lêçûnên herî kêm ên jiyanî dide. Ew li kêleka alîkariya fînansî xizmeta şêwirmendiyê jî dide. Armanc ev e, ku mirov qasî derfet hebe, bi lez dîsa di warê aborî de li ser lingên xwe rawestin. Gava kesek alîkariyeke din a diravî ya têrî debara jiyana xwe ji ciyekî bistîne -wek mînak pereyê bêkariyê , tibaba teqawîdiyê, mûçe yan alîkariya ji xizman were û gava ji qûtê nemirî zêdetir hatineya diravî hebe, alîkariya civakî piştgiriyê nade mirov. Alîkariya civakî bi riya kesên bacê didin tê fînansekirin.

## Serlêdana alîkariya civakî

Kesên dixwazin serlêdana alîkariya civakî bikin, divê serî li Saziya Xizmeta Civakî (Sozialdienst) ya şaredariya lê rûdinin, bikin. Divê mirov li wê derê hatineya xwe ya diravî û maldariya xwe bi awayekî eşkere diyar bike. Piştre wê lêpirsîna daxwazê were destpêkirin. Rayedar çiqasbûna alîkariyê û awayê alîkariyê bi awayekî kesane tespît dikin. Kesên daneyên ne rast bidin an hin tiştan veşêrin ew cezakirinê heq dikin. Saziya xizmeta civakî dikare hin şertan deyne û tevgerîna li gor wan daxwaz bike. Gava mirov li gor wan şertan tev negere, ew dikare xizmetên dide kêm bike. Tevlêbûna axavtinên şêwirmendiyê pêwîst e. Mirov bi xwe berpirsyar e, ku ji bo rewşa xwe ya hewcedariyê derbas bike, çi ji dest were, bike.

## Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-baselstadt.ch/ku/soziale-sicherheit/sozialhilfe